



Tu bi xêr hatiye Legimusê û cîhana kitêbên dengdar!

Bi rêya hesabeka bikarhînanê ya şexsî, îmkân ji bo zarokî yê ku tu weliyê wî yî heye ku xwe bigehîne kitêbên dengdar.

Kitêba dengdar çi ye?

Kitêba dengdar ew kitêba çapkirî ye ya ku bi deng hatiye xwendin. MTM kitêbên dengdar li gor qanûna mafê talîfê çê dike. Ew bi taybetî ji bo wan kesan bi deng hatine xwendin yên ku ji ber seqetî, nexweşî yan birîndariyê xwendina kitêbên çapkirî jê re zor e.

Legimus çi ye?

Legimus kitêbxaneyeka dijîtal e û Daîreya medyayên berdest, MTM, jê berpirsyar e. Zarok dikare bi rêya hesaba xwe ktiêban dengdar deyn bike. Zarok dikare Legimusê hem li dibistanê û hem li demvalahiyê bi kar bîne.

Çi di Legimusê de heye?

Zêdetir ji 115 000 kitêbên dengdar, hem yên edebiyatê û hem yên zanyariyan, di Legimusê de hene. Kitêbên dengdar bi zimanên din jî hene. Di hin kitêbên dengdar de, tenê tekst hatiye xwandin; lê di gelek kitêbên dengdar de text û wêne jî hene. Pêşniyaz derbarê kitêban û nivîsar li ser mijarên balkêş di legimus.se/barn de hene. Zarok bi xwe jî dikare kitêban ji bo zarokên din pêşniyaz bike.

Zarok weha dikare kitêbên dengdar bixwîne

Zarok dikare bi gelek awayên cuda kitêbên dengdar bixwîne: di mobîlê, tabletê yan komputerê de bi rêya appa legimusê yan bi rêya bernameya webê Legimusê.

Alîkarî

Kitêbxaneyeka giştî yan ya dibistanê hesaba [kontoya] Legimusê îdare dike. Ji bo alîkariya hesaba legimusê, zarok dikare serî li kitêbxaneyê xwe bide..

Peymana bikaranîna Legimusê

- Kitêb li gor Qanûna mafê talîfê parastî ne û tenê heqê wan kesan heye yên ku ji ber seqetiyekê xwandina tekstên çapkirî ji wan re zehmet e wan bi kar bînin.
- Gava tu kitêba dengdar dadikişînî yan têxî Bokhyllanê [Refa kitêban], ew wek deynkirî tê hesab kirin. Dema deynkirinê 6 meh in. Mirov kitêbê vedigerîne bi rêya ku mirov wê ji refê bavêje.
- Agahdariyên daxilbûnê û kitêb ji bo bikaranîna şexsî ya zarokî ne û çênabe mirov wan bide kesên din.

Çi dibe heger zarok peymanê bi cih neîne?

- Heger zarokî peymanê bi cih neanî, heqê wî yê bikaranînê wê xizmetê namîne

- Belavkirina neqanînî ya kitêbên dengdar li gor qanûna mafê talîfê sûc e û mimkin e bibe sebaba doza mehkemeyê. Gava kitêbên dengdar tèn dakişandin, ew bi agahdariyên kesê deyndar tèn nîşan kirin. Heger kitêbbeka dengî neqanûnî bê belav kirin, MTM dikare deyndarê kitêbê bişopîne.

Parastina agahdariyan

MTM agahdariyên şexsî derbarê te û zarokê te li gor Qanûna parastina agahdariyan (GDPR, 2016/679/EU) diparêze. Nav, e-poste û nimreya şexsî [personnummer] yan tarîxa jidayikbûnê û nimreya naskirinê ya karta LMA-yê di qeyda bikarhîneran ya MTM-ê de tèn qeyd kirin. Heman tişt ji bo nav û tarîxa jidayikbûnê yê weliyê zarokî tê kirin. Nav, e-poste û nimreya şexsî [personnummer] û yan tarîxa jidayikbûnê û nimreya naskirinê ya karta LMA-yê divê her wext di qeyda bikarhîneran de hebin. Heger tu dijî qeydkirineka weha bî, MTM nikare hesabekê [kontoyekê] çê bike. Mimkin e ew agahdarî ji bo pêkanîna lêkolîn û nirxandinên statistîkî derbarê xizmetên me bîn bi kar anîn. Her dem heqê te heye ku tu qebûl nekî ku ji bo lêkolînan têkilî bi te bê kirin. Tu dikarî wê bi rêya “Mina Sidor” [Rûpelên Min] di legimus.se de yan bi rêya kitêbxaneya xwe bikî.

Kesên ku agahdariyên wan yê şexsî parastî û veşartî ne dikarin daxwazê bikin ku ew agahdarî di beşekê sirveşartinê yê qeydê de bîn parastin. Li wê derê, tenê nimreya şexsî [personnummer] û e-poste yan tarîxa jidayikbûnê, nimreya naskirinê ya karta LMA-yê ya zarokê te û e-poste, û nav û tarîxa jidayikbûnê ya weliyê zarokî tèn qeyd kirin. Tenê hejmareka sinordar yan karmendên MTM-ê dikarin agahdariyan bibînin.

Agahdariyên zêdetir li ser ka em çawa agahdariyên şexsî bi kar tînin di siyaseta me ya serweriya şexsî de hene. Ew di www.mtm.se/hantering-av-personuppgifter/ de hene

Heqê MTM-ê heye ku ji ber sebebên bidelîl qaîdeyên bikaranînê biguhere. Tu wek weliyê zarokî yê ku Legimusê bi kar tîne mecbûr î ku bi serê xwe ji guhertinan agahdar bibî û bê derenghêlan û gîrokirin Xizmeta bersivdanê ya MTM-ê agahdar bikî heger tu dijî wan guhertinan bî. Heger tu dijî guhertinan bî, ew tê wê maneyê ku MTM dikare bi serê xwe îmkana bikaranîna Legimusê îptal bike.

Ev peyman di 2018-05-22 de hatiye nû kirin û hêj berdewam e.

Razîbûnaweliyê zarokî

Tu wek weliyê zarokî bi vê formê razîbûna xwe nîşan didî ku zarokê te wek bikarhînerê Legimusê bê qeyd kirin.

Agahdariyên zarokî

Nav

Paşnav

E-posteya ku wek navê bikarhînerê ji bo Legimusê û ji bo şandina agahdariyên daxilbûnê û agahdriyên din.dê bê bi kar anîn. Çi qas ji te bê e-posteya zarokî ya ku girêdayî dibistanê ye nede ji ber ku gava zarok dibistanê temam dike ew e-poste namîne.

Nimreya şexî [Personnummer] yan nimreya hevkarîyê [samordningsnummer]

Heger zarok li Swêdê penaberxwaz be:

Tarîxa jidayikbûnê

Nimreya LMA-yê (XX-XXXXX)

Dema xelasbûna mideta karta LMA-yê

Agahdariyên weliyê zarokî

Tarîxa jidayikbûnê

Nav _____

Paşnav

Peymana bikaranîna û parastina agahdariyan

() Min, weliyê zarokî, peymanî bikaranîna Legimusê xwand û ez wê qebûl dikim.

() Ez, weliyê zarokî, qebûl dikim ku MTM bi awayê ku di nivîsa parastina agahdariyan ya qeyda bikarhîneran ya MTM-ê de hatiye behs kirin agahdariyên şexsî yên min û zarokê min bicivîne. Têkildarî bi bikarhîneran derbarê xizmetkariyan jî di nav bikaranîna agahdariyên şexsî de ye.

Cih û tarîx

Îmzeya weliyê zarokî
